Bê dirav e
# MIZGÎN
Hejmara 175
1- ÇILE 2025



# Naverok


Wênesazî

Wêjeya Zarokan

Lîsk

Welatê me

Tu dizanî

Tendirustî

Tîp û gotin

Navdar

Bexçeyê Navan

Jîngeh mala me ye

Jêhatiyên Zarokan

çîrok

Bixwînin û fêr bibin

Wêne û tablo



Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Cîhan Isma'îl
Baran zagros

Sererastkirina  Erebî
Abdulah Rehîl

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim


Wergera Sûryanî
Calînos Yûsif
îsa

Dîzayn
Mjed ALsadun

Her 15 rojan carekê Kovara Mizgîn ya zarokan ji
hêla saziya Ronahî ve tê derxistin

## Ji bo xêzkirina hirç,
## gavên li jêr bişopîne

## اتَّبعِ الخُطواتِ التَّاليةَ
## لِرسمِ الدُّبِّ



# DAPÎRA MIN

Dapîra min terzîvan e
Dilê wê mîna mircan e
Em gelekî jê hez dikin
Wek stêra li ezman e

Cil û bergan her çê dike
Kincên xweşik li me dike
Roja cejn û Erefatan
Nenûkên me hine dike

Çentê xweşik li me dike
Porê hilû tev şeh dike
Tûrikê me li mil dike
Kenê şêrîn ji dil dike


Em kulor û şekir tînin
Li ser berkê radixînin
Dapîra xwe radimêsin
Keser jidil derdixînin

Leyla Reşo

Hevalên min, werin em lîstika pirs û bersivên guncaw bilîzin; Em bersivê ji pirsên guncaw re hildibijêrin û wan bi xêzekê bighînin hev.


أصدقائي، تعالَوا نلعبْ لُعبةَ الأسئلة والأجوبةِ المُناسبةِ؛ فنختارُ الإجابةَ من بينِ الأسئلةِ المناسبةِ لهَا، ونُوصلُ السُّؤالَ والجوابَ بِخطٍّ.

Gerstêrka em lê dijîn.
كَوكبٌ نعيشُ فيهِ.



Stêrkek mezin ku erd û ezman ronî dike.


نَجمٌ كَبيرٌ يُضِيءُ السَّمَاءَ والأَرضَ.



Gerstêrkeke sor e li kêleka erdê ye.
كَوكبٌ أحمرُ مُجاورٌ لِلأرضِ.




Tişta ku li fezayê li derdora erdê digere.
الجسمُ الذي يدورُ حولَ الأرضِ في الفضَاءِ.



Cihê ku astronot lê dijîn, ji bo vedîtina fezayê.

مكانٌ يعيشُ فيهِ رُوَّادُ الفضاءِ، لِيكتشِفُوا الفَضاءَ.



# Keleha Hewlêrê


Keleha Hewlêrê li bajarê Hewlerê yê Başûrê Kurdistanê ye. Ew bajarê herî kevnar ê cîhanê ye û dîroka avabûna wî
vedigere beriya 6 hezar sal. Keleh mezin e û li ser girekî li navenda bajarê Hewlerê hatiye avakirin. Ew bi dîwarên mezin dorpêçkirî ye. Têde gelek çîrok û efsaneyên kevnar çêbûne. Di hundirê kelehê de
muzexaneyek piçûk heye ku tê de berhemên dîrokî yên jiyana
mirovan di serdemên kevnar de nîşan didin, hene.

# قَلعةُ هولير

تقعُ القلعةُ في مدينةِ هوليرَ بباشورَ كردستانَ، وتُعرَفُ بقلعةِ هولير .
وهيَ أقدمُ مدينةٍ مَأهولةٍ في العَالمِ، فيَعُودُ تاريخُها إلى 6000 سنة.
القلعةُ كبيرةٌ ومَبنيَّةٌ على تلٍّ وسَطَ مدينةِ هولير، وهِيَ مُحاطَةٌ بجُدرانٍ ضخمةٍ. فَفِيها حَدثتْ حِكايَاتٌ قديمةٌ وأَساطيرُ كثيرةٌ. وفيها مُتحَفٌ صَغيرٌ داخلَ القلعةِ، الذي يحتوي على قطعٍ أثريَّةٍ، تُظهر حياةَ النَّاسِ في العصورِ القديمةِ.



# Tu dizan?
# هَلْ تَعْلَمُ؟



Deve dikare 40 litre av di 10 xulikan de vexwe! Jê re ‘keştiya çolistanê’ tê gotin, ji ber ku ew dikare demên dirêj bê av bimîne.

أَنَّ الجملَ يمكنه أنْ يشربَ 40 لترًا منَ الماءِ في عَشْرِ دقائقَ؟ فهُوَ يُسمَّى "سفينةُ الصَّحراءِ" لأنَّه يستطيعُ البقاءَ لفتراتٍ طويلةٍ دونَ ماءٍ!

Morî dikare tiştên 50 çarî ji senga xwe girantir, rake!

أَنَّ النَّملَ يستطيعُ رَفعَ أشياءَ أثقلَ من وزنهِ بخمسينَ مرَّةٍ!

# Sûdên rûkeniyê




Hevalên min, hûn dizanin ku rûkenî ne tenê ji bo kêfxweşiyê ye, ew dihêle ku rûyê we jî xweşktir bibe û hestên kêfxweşiyê li cem we çêdibe? Dema hûn rûken bin, gewdeyê we heybera Êndorfîn ya ku dihêle hûn rehetiyê hîz bikin, hildbirîne. Herdem bi malbat û hevalên xwe re rûken bin.


# فَوائِدُ الابتسامَةِ

أصدقائِي، هلْ تعلمون أنَّ الابتسامةَ لَيستْ لِلفَرحِ فقط، بل هيَ أيضًا تجعلُ وجوهكم أكثرَ جمالاً، وتُعطيكمُ الشّعورَ بالسَّعادةِ؟ فعندما تبتسِمُون، يفرزُ جسمُكم مادَّةً تُسمَّى "الإندورفين"، الَّتي تُشعرُكُم بالرَّاحةِ. فَابتَسمُوا مع الأهلِ والأصدقاءِ دائمًا.



أصْدقائِي الأعزاء، أكملُوا الحَروفَ النَّاقِصةَ؛ لتُكملوا الأسماء حَسَبَ صُوَرِها.





# الشّاعرُ نَالِي

وُلد الشَّاعرُ الملا خضرُ بنُ أحمدَ الميكائلي، والمُلقَّبُ بِنالِي في مِنطقةِ شهرزورَ بمحافظة السُّليمانيَّةِ في باشور كردستانَ عام 1797. كتبَ نالِي قَصائدَ جميلةً عنِ الحبِّ والطَّبيعةِ والصَّداقةِ، وكانَ يَستخدمُ كلماتٍ بسيطةً ومُؤثرةً وقَريبةً منْ قلوبِ النَّاسِ، وزارَ مدناً كثيرةً، مثلُ، بغدادَ، وإسطنبولَ ليتعلَّمَ، لكنَّهُ بقِيَ يكتبُ بلغتهِ الكرديَّةِ؛ ليعبِّرَ عنْ مشاعرِ النَّاسِ، تُوفِّيَ نَالي في إسطنبولَ منْ عَامِ 1855، وما زالتْ قصائدُه تُقْرَأُ في كلِّ مَكانٍ.

# Helbestvan Nalî

Helbestvan Mele Xidir kurê Ehmed El-Mîka'ilî ku bi nasnavê Nalî tê nasîn, di sala 1797'an de li herêma Şehrezorê a parêzgeha Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê ji dayîk bûye. Nalî li ser evîn, xweza û dostaniyê helbestên xweş nivîsandiye. Gotinên hêsan û xweş yên ku dilê mirovan xweş dike , bikar dianîn. Ji bo fêrbûnê serdana gelek bajarên wekî Bexda û Istenbolê kiriye. Lê ji bo ku hestên mirovan vebêje, tenê zimanê kurdî bikar aniye. Nalî di sala 1855'an li Istenbolê koça dawî kir. Heta niha jî helbestên wî li her derê tên xwendin.

# Hin Navên bi tîpa -N

Nazdar

Newroz

Nalîn

Narîman

Nûbar

Nêçirvan

Nihro

Nûzad

# Kêzikên bisûd

Hin kêzikên biçûk hene pir dixebitin da ku sûdên bidin mirovan. Weke mêşa hingiv ku tozkulîlikan vedughêze û kurmê erdê ku axê dikole û hewa dike. Dema ku tu kêzikekê biçûk bibîne, bîn bîra xwe ku ew bi sûde û hevalê jîngehê ye. Herwiha di parastina hevsengiya erdê de ew xwedî roleke sereke ye.

# الحَشراتُ المُفيدةُ

هُناكَ حَشراتٌ صَغيرةٌ، تعملُ بجدٍّ لتفِيدَ النَّاسَ، مثلُ النَّحلُ، الَّذِي ينقلُ حُبوبَ اللِّقَاحِ، والأَرْضَةُ، الَّتِي تَحفرُ التُّربَةَ وتُهَوِّيَها، فَعندَما ترَى حَشرةً صَغيرةً، تذكَّرْ أنَّها مفيدةٌ، وصَديقةُ الطَّبيعةِ، وهِيَ تلعبُ دورًا كبيرًا في الحِفاظِ على التَّوازُنِ في الأرضِ.





## Seyran Haşim Egîd

Ez ji bajarê Amûdê me, ez deh salî me, ez di pola pêncemîn a dibistana seretayî de dixwînim. Jêhatiyên min; lêdana tembûr, biziq, gîtar, stranbêjî û dîlangtine. Ez ji wînexêziyê, werzîşa cambaz û taykowando jî hez dikim. Dayik, bav, metik û
mamosteyê min piştgiriya min dikin. Ez jî bi perwerdeyê
jêhatiyên xwe pêş dixim.
Ez dixwazim bibim dermansazeke serkeftî û di demên guncaw de jêhatiyên xwe bikar bînim.

## سيران هاشم عكيد

أنا مِن مَدينَةِ عَامودا، عُمري عشْرُ سَنَواتٍ، أدرسُ في الصَّفِّ الخامسِ الابتدائيِّ، هُواياتي العَزفُ على الكِيتارِ والرَّقصُ، والغِناءُ، والعَزفُ على الطُّنْبُورِ والبِزْقِ، أُحِبُّ الرَّسمَ، ورِياضةَ الجُمبازِ والتايكواندو.
أمِّي وأبي وعمَّتي ومعلِّمي زكريا، يُشجِّعونَني دائماً، وأنا أُنمِّي مواهبي بالتَّدريبِ المستمرِّ.
وأريدُ أنْ أُصبِحَ صيدلانيةً ناجحةً، وأمارسُ هُواياتي المُفضَّلةَ بالوقتِ المُناسبِ.


Çîroka : Bexçeyê Mala Bextewar
Xweziya ku bexçeyekî me yê xweşik li vir hebûya!
Çima em bi xwe bexçeyekî naçînin? Hin tov li cem nin hene.
Tov? Ma ev tovên biçûk dikarin bibin bexçeyekî mezin?
Belê, lê ev yek bêhnfirehî û guhdayînê dixwaze.


Ez ê xiyaran biçînim! Ez ji xwarina sebzeyan hez dikim.
Niha pêwîste hûn bi awayekî rêkûpêk tovan av bidin.
Ka em bibîn ku wê kîjan zûtir şîn bê, xiyar yan kulîlik!
Amara binêre! Ew şîn tê!


Guhdayîna şînatiyan cihê kêfxweşiyê ye, ez hîz dikim ku em lehengên bexçe ne!
Ev semad dê bibe alîkar ku şînatî xweşik û bihêz bibin.
Ez dixwazim şînatiyên xiyaran mezintir û xweşiktir bibin.
Wayyy, bexçeyê me pir bedew bûye!


Niha qaseyek ji xiyarên teze hene, ka em wan bi malbatê re parve bikin!
Çiqas xweşike, ez li ser keda we di çandiniyê de spasiya we dikim!
Ev bexçe dihêle ku ez xwe serbilind hîz bikim, ev bi saya hezkirin û keda me ye! Spasiya mezin ji daika min re ku em teşwîq kirin.
Baxçeyê me tijî jiyan bûye, ez kêfxweş im ku me biryara çandina wê da!
Carinan, tiştên piçûk ên mîna tovan dikarin bibin tiştek xweşik, ger em guh bidin wan!
Belê delalên min, baxçeyê me yê piçûk her dem hewcedarê hezkirin û lênêrînê ye.



Hêlan

أُرْجُوحَةٌ

Swing

ܐܪܓܘܚܐ-ܕܘܠܬܐ



Rûniştek

كُرْسِيٌّ

Chair

ܟܘܪܣܝܐ



Avweşînk

نَافُورَةٌ

Fount

ܡܒܘܥܐ



Mase

طَاوِلَةٌ

Table

ܛܒܠܬܐ

Çavê Mizgîn

# Wêne û tablo

# لقطة العدد



مجاناً

العدد
175
1 - كانون الثاني
2025

